nîneke din ve ji bona têgihiştina Idialistîyê yaxud Metiryalistîyê (di bin têgihiştina felsefê de) bes û bi tenha ve tevlihevbûnê dide bipeydakirin. Marx bi carekê ve ne bes tenê îdialistîya bi vî tonî yaxud yê din ve didate biavêtin, yê ku ew her û her bi oldarîyê ve dihatin bigirêdan; lêbelêjî wî dîtînen Hume û kant jî didatin biavêtin, yê ku ew di van rojên me de bi taybetî ve pir têtin bibelavkirin. Herwehaji Agnostizmus -Nekarîbûnê-, Kritizmus -Rexnegîrî, wehaji Positivismus -Başîî- bi hemû rengên xwe ve felsefeyeke wetov li nik Marx de her û her ew mîna dakevtineke "Kevneperestî" dihatin biderkevtin. Ji bona Idialistîyê û di başbûna xwe de ew bi her awayekî ve mîna renekî bêşermbûn ve dihat biderkevtin, ya ku ew bi dizî ve bi metiryalistîyê ve dihat bipêrûniştin; belam beramberî bi Xelkê ve wê xwe jê didate bidûrkirin." Li ser vê pirsê de, ji bil wan nivîstên Marx û Engelsî hatine bidan, ji xwe re li nameya Marx ji bona Engels di 12. befirbara 1868 de bidin bitemaşekirin, ya ku têde Marx li ser peyva Lêgervanê Seruştîyî bi nav û bang ve Th. Huxley dide binivîsandin, ku ew têde dide biderxistin, ku ev Zanîstvanê hanê bi "Matiryalist" ve tete biderkevtin, bêtir ku ew xwe dide biderxistin û ew hate bimukurhatin. "Weha bi dirêjbûna ku em bi rastî ve çavlebûnê û remanê didin bikirin, em nikarin bi tu awayekî ve xwe ji metiryalistîyê bidin biderxistin". Pêrejî Marx nav bi dû wî ve dide bixistin, ku wî "dergeyekî veşartî" ji bona Agnostizmus -Nekarîbûnê- û ji bona dîtina Hume date bivekirin¹⁷.

¹⁷Ji xwe re li Nivîstên Karl Marx/Friedrich Engels, bergê 32, r. 229 de bidin bitemaşekirin).

Bi taybetî ve divê bêtir bîr û baweriyên Marx li ser pêwendîya di navbera azadiyê û niyazmendîyê de bête bieskerekirin. "Niyazmendî bes û bi tenha ve bi kor ve têtê biderkevtin, tanî ku ew neyête biliberkevtin... Azadî bi têgihiştina niyazmendîyê bi xwe ve têtê biderkevtin". (Engels "Anti Dühring")¹⁸. Evaya bi pêrûniştina qanûnmendîyên bi serê xwe ve ji yê seruştyê û guhertina pêwistîya diyaliktîkî ji bona azadîyê dide bixuyanîkirin. (Pêrejî ew bi guhertina "tiştê bi xwe ve" nenas, lêbelê yê ku ew dikare bête binaskirin, ji bona "tişteki ji bona me" ji yê "cewhera tiştan" di "xuyanîyan" de dide biguhertin").

Kêmanîya bingeşê di metiryalistîya "kevin" de û pêrejî di metiryalistîya Feuerbach û (herwehaji di metiryalistîya "Arzani" Büchner, Vogt û Moloschot de) di dîtina Marx û Engels de di van xalên hanê de dihate bidîtin:

1. Ku ev metiryalistîya hanê bi "pirbûn ve bi mîkanîkî ve dihate biderkevtin", ya ku pê nuhtirîn û pêşkevtinên kîmyayî û biyolocî (di van rojên me de têtin bipêvekirin. Ew bi dîtina Eletirîkîyê metiryê) guh pê nadin bidan.
2. Ku metiryalistîya kevin ne bi mêjûyî ve û ne jî bi

¹⁸Ji xwe re li Nivîstên Karl Marx/Friedrich Engels, bergê 20, r. 106 de bidin bi temaşekirin.

Herwehaji li xwarê de Lenin ji wî bergî careke din ji xwe re ji rûpelên 10 û 22 dide biwergirtin.

37 Sê Kanî û Sê Pêkhatinên Markisistîyê

diyalîtîkî ve dihate biderkevtin, (ew bi mêtafizîkî ve bi liberkevtina dijî diyalîktîkî ve dihate biderkevtin), nejî wê dîtina pêşkevtinê tanî dawî ji hemû alîyekî de ji xwe re didate biderxistin.

3. Ew li ber "cewhera Merov" de nala rûtbûnekê bi serê xwe ve û ne mîna "komekê ji pêwendîyên civakîyî tevayî" (ji yên mêtû bi şêweyekî rast û durustî pêkhatî ve) dihate biliberkevtin; Jibervêyekê jî ve dunya bes bi tenê ve bi "lêvegerandin" ve dihate biderkevtin, di dema ku bi nêt ve dihate biderkevtin, ku wê "bidin biveguhertin", ango metiryalistîya kevin giringbûna "jêhatîbûna karîyî şûreşgêrî" nikarîbû bihata biliberkevtin.

Diyaliktik

Di diyaliktika Hegel de Marx û Engels firehtirîn û di nava xwe de dewlemendtirîn û kûrtirîn rêya pêşkevtinê didatin bidîtin, ya ku felsefa Elmanîyî kilasîkî bi destên xwe ve date bixistin. Her şeweyekî daxuyanîkirinê li ser bingehê pêşkevtinê û xwe veguhertinê de ji wan re bi yekalî ve û bi perîşan ve dihate bixuyanîkirin û ew di çûna rastîya pêşkevtina xwe de bi veguhertî ve û ji qalikê xwe bi derkevtî ve didate biderxistin, (ya ku wê xwe pir caran di çengbûnan de, di wêranîyê de, di şûreşan de û di rakîşandina) pêşvekevtinê de di seruştiyê û civakê de didate bipêkanîn. "Ez û Marx bigir bi tenha xwe ve dihatin biderkevtin,... yên ku wan diyaliktîka bi şiyarî ve ji bona liberkevtina metiryalî ji bona seruştiyê dane birizgarîkirin" (ya ku ew ji tarûmarkirina nimûnetiyê û pêrejî ji îdiyali-stîya Hegel bi xwe jî ve dihate biderkevtin). "Seruşti bi cihê ceribandîne ve li ser diyaliktîkî de têtê biderkevtin û divê bête bigotin, ku zanistiyên seruştiya nuh bi xwe ve ji bona vê ceribandina hanê pir tiştên zor bi nerx û buha ve bi rojane ve dane bipêşkeşkirin". (Evaya jî hatîye binivîsandin, berî ku Radium, Elktronen û veguhertinên Perçan hd... bêtin bidozandin), "ev tiştên hanê roj bi roj ve bi bêtir ve dihatin biderkevtin. Weha van zanistiyên hanê didatin bicîanîn, ku di seruştiyê de di dawîya dawî de bi diyaliktîkî ve û ne bi mîtafizîkî ve têtê bikarkirin."

Engels date binivîsandin: "Remana bingehîyî mezin ku cîhan ne bi mîna tevayekê ve ji tiştên bi durustkirî ve lê bête bitemaşekirin; lêbelê divê li wê de nala tevayekê ji kirinan lê bête bitemaşekirin, ji yên ku ew di xuyanîya xwe de bi tiştên hîmkirî ve têtin biderkevtin, ji

yên ku ew bi nala wêneyên remankirî ve di nava serên me de, ango têgihîştin bi veguhertineke li dû hevdû de ji bûyîn û windabûnê tête biderkevtin... -Ev remana bingeşyê mezin bi rengê pir kûr ve ji dema Hegel de di liberkevtina tevayê de hate bicîhatin, tanî bigir ku kes nema ye, ku ew di rengê wê tevayê de bi dijî wê ve êtir tête biderkevtin. Belê bi vê remana hanê ve bi serê ziman ve pê bêtin birûniştin, ew bi tiştêkî ve tête biderkevtin û di rastîyê de bi cîanîna wêna ve û herwehaji di berên lêgerandinên cudan de bidin bicîhanîn, ew bi tiştêkî din ve tête biderkevtin". "Li ber wê de" (felsefa diyaliktikî) "tiştêkî bi bê dawî ve, bi serê xwe ve, bi perest ve nayetê biderkevtin. Ew di her tiştêkî de û li ser her tiştêkî de nemanbûnê dide bidîtin û tu tişt li ber xwe de nayête bidîtin, ji bil ku ew bi nala kirineke li dûhevdû de ji bûyînê û nemanê, ji berzbûna bi bê dawî ve ji hilatîyê û dahatîyê dide bidîtin. Ev felsefa hanê bes û bi tenha xwe ve bi mirêka vê livandina hanê ve di mejîyê Remangîr de tête biderkevtin". Li gora bîr û bawerîya Marx de diyaliktik "bi zanistîya qanûnên tevayîyê livandinê ve çî ji yê cîhana derve û herwehaji çî ji yê remana merovanîyê bi xwe jî ve têtin biderkevtin"¹⁹.

Ev alîyê şureşgêrî ji felsefa Hegel de Marx ew ji xwe re date biwergirtin û wî ew date bipêşvexistin. Metiryalistîya Diyaliktikî "nema bêtir bi pêwistî felsefeyekê ve tête bikirin, ya ku ew li ser zanistîyên din de tête biderkevtin". Tiştê ku ji felsefa kevin hêjî tête bimayîn, "ew bi rêya remankirinê û qanûnên wê ve -logikê

¹⁹Ji xwe re li Friedrich Engels: Ludwig Feuerbach ..., di nivîstên Karl Marx/Friedrich Engels, bergê 21, r. 267/268 û 293 de bidin bitemaşekirin.

formêl û diyaliktik- têtê biderkevtin"²⁰. Diyaliktik li gora bîr û bawerîya Marx de û herwehaji li gora bîr û bawerîya Hegel jî de ew bi ber xwe ve dide bigirtin, ya ku Merov îro jê re bi tiorîya -dîtina- zanebûnê yanjî Gnoesologiê ve dide bigotin, ya ku danava wê divê pêrejî bi regekî mêjûyî ve lê bête bitemaşekirin, di dema ku ew di peyda-bûnê û pêşkevtina zanebû de, di veguhestina wêna de ji nezanîyê ji bona zanebûnê lê dide bigerandin û ew wê dide bitevayîkirin.

Di vê dema me de remana pêşkevtinê û pêşveçûnê bigir bi carekê ve ji bona şiyarbûna civakê lêbelê di rêyên din de û ne li ser rêya Hegel de hatîye bikevtin. Bes û bi tenha xwe ve di şeweyê derxistinê de, yê ku Marx û Engels li ser bingehîya Hegel de dane bidanîn, ev remana hanê bi tevayî ve, bi giştî ve û pir di nava xwe de bi dewlemend ve ji remana belavkirî li ser pêşveçûnê de têtê biderkevtin. Pêşveçûnek, ya ku ew di koçên berê de têre dihatin biderbasbûn, pêre careke din jî ew têre têtê biderbaskirin, lêbelê ew bi regekî din ve û bi pileyekî bilindtir ve "Negation der Negation" -bi nayînkirina nayînkirinê ve- têre têtê biderbaskirin. Pêşkevtinek, ya ku ew ne li ser xêzeke rast de, lêbelê weha Merov dikare bide bigotin, pêşkevtineke badayî bi xwe ve ber bi jor ve têtê biçûyîn; ya ku ew bi çengbûnan ve, bi wêranbûnan ve û bi pêşkevtinên şûreşgêrî ve têtê bigirêdan; "devjêberdanên hêdî hêdî" veguhertinê kombûnê ji bona başbûnê; palpêdanên pêşvekevtinên di nava xwe têtinbiderkevtin, yên ku ew di rêya dijbûnan de û li binguhênhevdû de kevtinên hêz û berên cudan de ji hev têtin bipêkhatin, yên

²⁰Ji xwe re li Firidrich Engels: Anti-Dührin, Nivîstên Karl Marx/Friedrich Engels, bergê 20, r. 24 de bidin bitemaşekirin.

41 Sê Kanî û Sê Pêkhatinên Markisistîyê

ku ew li ser laşekî nîşankirî de pê didin bikêrkin, yanjî yên ku ew di tevaya xuyanîyeke nîşankirî de, yaxud yên ku di nava civakeke nîşankirî de pê didin bikêrkin; yên ku ew bi hev re têtin bigirêdan û yên ku ew bi pêwendîyeke xurtî ve ji hev ji hemû alîyan de nayêtin bibirîn, (yên ku ew di mêjûwê de her û her alîyên nuh ber bi xwe ve didin bixistin), ku têde pêwendîyekê, yekitîyekê, qanûnmendîyekê ji bona pêşveçûna cîhanêyê livandinê dide biderxistin, -ev bi hin ji rûçikên diyaliktik ve têtin biderkevtin, yên ku ew bi rêyeke dewlemend ve ji yên pêşveçûnê ve têtin biderkevtin, ji yên ku ew di nava xwe de pir bi dewlemend ve, (berambrî bi yên hene), têtin biderkevtin. (Ji xwe re li nameya Marx ji bona Engels de di 8. rêbenda sala 1868 de bide bitemaşekirin²¹, ya ku wî têde qerfê xwe li ser Stein de: "Gotinên valayî pûç" bi bêvacîya tevlihevkirina wan ve ligel diyaliktika metiryalistî de dayîte bikin).

²¹Ji xwe re li Namênveguhestî de, di nivîstên Karl Marx/Friedrich Engels, bergê IV, r. 8, Berlin 1950 de bidin bitemaşekirin.

Têgihîştina Metiryalistîyî Mêjûyî

Marx bi valabûna metiryalistîya kevin ve ji logik û negihandin û yekalîbûna wêna hate biliberkevtin, ku divê ew "zanistîya civakî... bi bingehe metiryalistîyê re bide bilehevanîn û ew wê li ser bingehe metiryalistîyê de careke din bide avakirin"²². Metiryalistî bi carekê ve şiyarbûnê ji hebûnê û ew ne bi servajî wê ve dide biderxistin. Weha metiryalistî di bikaranîna xwe de di jîna civakîya merovanîyê de dide biderxistin, ku ew şiyarbûna civakî ji hebûna civakî bide biderxistin. Marx dide bigotin: "Teknolocya şeweyê jihatîbûna reftara Merov beramber bi seruştîyê ve dide bidiyarkirin, ango karkirina xweser ji berkirina kirina jîna wîna de dide biderxistin, pêrejî ew pêwendîyên jîna wîyî civakî, bîr û bawerî û têgihîştinên wîyî remanî jê têtin bikanîkirin". ("Sermiyan" I,²³). Di pêşgotina nivîsta xwe de "Li ser Rexnekirina Aburîya siyasî de" Marx nîşankirineke tevayî li ser bîr û bawerîyên bingehiyî metiryalistîyê de date bidan û wî ew ji bona ser civaka Merovanîyê û mêjûwa wîna de di van gotinên hanê de date bifirehkirin: "Di civaka berkirina jîna xwe de Merov di nava xwe de pêwendîyên berkirinêyî pêwistîyî nîşankirî didin bikirin, yê ku ew ji vîna wan bi azad ve têtin

²²Ji xwe re li Nivîstên Karl Marx/Friedrich Engels, bergê 21, r. 280/281 de bidin bitemaşekirin).

²³Ji xwe re li Nivîstên Karl Marx/Friedrich Engels, bergê 23, r. 393 de bidin bitemaşekirin).

biderkevtin, yên ku ew di qonaxeke nîşankirî de ligel hêzên berkirinêyî metiryalîyî xwe de têtin bilihevhatin.

Tevayabûna van pêwendîyên berkirinê gewdeyê abûrîyî civakê dide biavakirin, yê ku ew bingehê rastî dide bipêkanîn, ku li ser wî de avanîya jorîyî mafeyî û siyasî xwe dide bibilindkirin, yên ku ew rengên şiyarbûna civakîyî nîşankirî li gora xwe de didin biderxistin. Şêweyê berkirina metiryalîyî jînê kirinên civakî, siyasî û remanî bi carekê ve dide bimerckirin. Ne şiyarbûna Merovan hebûna wan didin bi nîşankirin; lêbelê bi servajî vêna jî ve hebûna wanî civakî şiyarbûna wan dide binîşankirin. Di koçeke nîşankirî de di pêşkevtina xwe de hêzên berkirinêyî metiryalî bi dijî pêwendîyên berikirinêyî heyî ve têtin biderkevtin, yanjî ew ligel alîyê wêyî mafeyî de têtin biderkevtin, yê ku jê re bi pêwendîyên Xwedîbûnê ve têtê bigotin, yên ku wan xwe di nava wan de tanî wê çaxê didatin bilivandin. Ji bona van rengên pêşkevtina hêzên berkirinê ev pêwendîyên hanê bi bend ve ji wan re têtin biderkevtin. Di wê çaxê de pêla şûreşên civakî didin bidestpêkirin. Bi guhertina bingehê abûrî ve dê tevaya avanîya jorîyî mezin bi hêdî hêdî ve yanjî bi lez ve ji binî de xwe bide biguhertin. Bi temaşekirina veguhertinên bingehîyî wisa ve divê Merov her û her di navbera guhertinên bingehîyî metiryalî de ji mercên birkirina abûrî de, jiber ku ev guhertina bingehîyî hanê bi hûrbûna zanistîya seruşî ve têtê bisînorkirin û di navbera rengên mafeyî, siyasî, oldarî, hunerî yanjî felsefî, bi kurtî ve bi rengên cîhanbînî ve bide bicudakirin, yên ku Merov têtê vê pevçûnê bi şiyar bûn ve dihêlin bête bikirin û ew ligel wê de didin bişerkirin.

Weke ku bîr û bawerîya me li yekekî de nabe bête bibingehkirin, bê ka ew çî di serê xwe de dide

biremankirin, wehajî em nikarin bîr û bawerîya xwe li ser pêla veguhertina bingehî ji şiyarbûna wê de bidin biderxistin; lêbelê ev şiyarbûna hanê divê ji dijûnên jîna metiryalî, ji pevçûnên hene di navbera hêzên berkirinên civakî û pêwendiyên berkirinê de bêtin bederxistin... Bi xêzên xweyî mezin ve şeweyê Asyayî, şeweyê Antikê, şeweyê Derebegîyê û şeweyê Borcuwazîyê ji pêwendiyên berkirinê bi nala pêlên pêşverû ve ji pêkhatiyên civakîyî abûrî bêtin jimartin". (Ji xwe re li rengê wêyî bi kurtî ve bide bi temaşekirin, yê ku Marx ew di nameya xwe de ji bona Engels di 7 axlêva sala 1866 de dayite binivîsandin: "Dîtina me li ser nîşankirina bi rêxistina kar ve di rêya destikên berkirinê de")²⁴.

Dozandina têgihîştina metiryalîyî mêtûyî yanjî rastir: ji dil û can bi cihanîn û firehkirina metiryalistîyê li ser berê xuyanîkirinên civakê de wê du kêmaniyên bigehîyî dîtînen mêtûyîyî berê dane bihilanîn. Van dîtînen hanê di başûnên xwe bes û bi tenha ve didatin biderxistin: Yekem ku nêtin remanên refarîkirina mêtûyîyî Merovan bi danavê ve ji bona lê bi temaşekirinê ve hate bidanîn, bêyî ku li wan de bête bigerandin, bê kanî ev nêtin remankirî ji kûderê de hatine biderkevtin, bêyî ku li serêwebûna kêrkirina qanûnmendîyê de di pêşkevtina sustemê de di pêwendiyên civakî de bête biliberkevti, bêyî ku rehên wan pêwendîyan di pêşkevtina pileyê metiryalîyî berkirinê de bidin bidîtin. Duwem dîtînen berê wan bi xwe ve refarîkirinên komên Xelkê di ser guhên xwe re didatin biavêtin, di dema ku metiryalistîya mêtûyî di cara pêşî de karîna jêre date bidan, ku bi rastîyeke mêtûyîyî seruşti ve li

²⁴Ji xwe re li Nivîstên Karl Marx/Friedrich Engels, bergê 13, r. 8/9 de bidin bitemaşekirin).

mercên jîna civakîyî komên Xelkê û herwehaji veguher-
tinên van mercan de bête bilêgerandin. "Zanistîya Civakî"
û nivîsandina mêjûyî berî Marx di başbûnên xwe de di
komkirina xwe de ji bûyînên xav de li gora kevtina di nava
destan de û di xuynîkirina xwe de ji bona hin aliyen teka-
neyî kirinên mêjûwê de dihatin biderkevtin. Markisistîyê
rê ji bona lêgerandina kirinên pêkhatinê bi carekê ve û ji
hemû aliyekî de, ji bona pêşkevtinê û herifandina
pêkhatîyên civakîyî abûrî date bixuyanîkirin, ev jî bi
lêveneradina wêna ve ji bona tevayabûna berên pevçûnkirî
ligel hevdû de dihate biderkevtin û bi vegerandina wan ve
li ser nîşankirina rast û durust de ji bona pêwendîyên jîn û
civakîyî çînîyên cuda ji civakê tête biderkevtin û wê
Subjektivîsmus -xweyîbûn- û Willkür -kêfxweşî- di hel-
bijartinê de yanî derxistin remanên "zalkirî" date bihila-
nîn. Wê rehên hemû remanan bi bê cudanbûn ve û hemû
berên cuda di rewşa hêzên berkirina metiryalistî de didatin
bidîtin. Merov bi xwe ve mêjûwa xwe didin bidurustkirin;
belam di çî de nêtên Merovan û herwehaji nêtên
Cemaweran ji Merovan têtin binîşankirin, çima pevçûn di
navbera reman û daxwazan de têtin bikirin, çî tevaya bi
carekê ve ji van pevçûnan di tevaya koma civaka
Merovanyê de dide bipêkanîn, çî mercên bi serê xwe ve
berkirina jîna metiryalî têtin biderkevtin, yên ku ew bingeh-
hîyê ji bona hemû reftarîkirinên mêjûyî ji bona Merovan
didin biafirandin, bi çî rengî ve qanûna pêşvekevtina van
mercan tête biderkevtin, - ji bona van pirsan tevan Marx
berê guhpêdanê pê date bidan û wê wetov jî rê ji bona
lêgerandin zanistî ji bona mêjûwê date bixuyanîkirin, ku
divê lê bi nala yekîtîyekê ve di tevaya pîrbûna xwe de û di
dijbûnên kirinên qanûnên mendî de bête bitemaşekirin.

Xebata Çînî

Diya re, ku di her civakê de daxwazên yekekî ji Endanên civakê li bin guhên daxwazên yekekî din de têtin bikevtin, ku jîna civakî bi dijûnan ve tete bidagirtin, ku mêtû ji me re pevçûnan di navbera miletan û civakan de dide bixuyanîkirin û herwehaji pêrejî ew ji me re bi serdejî ve pêlên veguhertî ji şureşan û kevneperestiyê, ji aştiyê, ji cengan, ji sarkirinê û ji pêşkevtinên û herifandinên bi lez ve dide bixuyanîkirin, -ev hemû bi carekê ve bi rastiyên giştî ve têtin binaskirin. Markisistiyê ji me re xaçirêkekê dide bidiyarkirin, ya ku ew di vê xuyanîya tevlihev û dujwarîyê hanê de qanûnmendiyekê dide bidozandin: Ew jî di dîtina xebata çînî de tete biderkevtin. Bes û bi tenha ve lêgerandina tevaya daxwazên hemû Endamên civakeke heyî de yanjî guruhekê ji civakan ji me re didin bibihîştin, ku em encamên van daxwazan li ser bingehekî zanistî de dikarin bidin binîşankirin. Koka daxwazên bi dijîhevkerî ve di cudabûna zînetê de û di mercên jîyana çînîyan de tete biderkevtin, ya ku tede her civakek pê tete biperçekirin. Marx di "Manifêsta Komonistiyê" de" date binivîsandin: "Mêtûwa hemû civakên berî niha", (di pişt re Engels date biservekirin: ji bil mêtûwa hovîtiyê ve), "bi xwe ve bi mêtûwa çînîyan ve tete biderkevtin. Serbest û Bende, Bazirgan û Bajarî, Xanedan û Gede, Hoste û Şagirt, bi kurtî ve Zordar û Zorlêker bi beramberî dijî hevdû ve her û her dihatin birawestandin, wan ligel hevdû de geh bi dizî ve û gehjî bi eşkere ve didatin bixebatkin, xebatek ya ku ew hercar bi veguhertineke şureşgêrîyê ji bona tevaya

civakê dihate bidawîkirin, yanjî ku ew bi windabûna çîniyên xebatkirî de ligel hevdû de dihate bidawîkirin... Civaka borcuwazîyî nuh, ya ku ew ji windabûna civaka derbegîyê hate biderkevtin, wê dijbûnên çîniî nedane bihilanîn. Wê bes û bi tenha ve çîniyên nuh, mercên nuhî lêzordarîkirinê, şeweyên nuhî xebatê li şûna yên kevin de date bidanîn.

Pêla me, pêla Borcuwazîyê xwe dide binîşankirin, ku wê dijbûnên çîniyan daye bisadekirin. Tevaya civakê xwe her û her di bendên dijminî mezin ve, di du çîniyên gewreyê beramber hev de dide biparvekirin: Di Borcuwazîyê de û di Pirolitarya de dide biparvekirin"²⁵. Ji dema şureşa gewreyî Firensî de mêjûwê di jimarekê ji welatan de bi diyarbûn ve hoyên rastîyîn bûyînan di xebata çîniyan de date biderxistin. Pêla vegerandina Padîşahîyê de li Firensa de bi xwe jî ve rêzek ji Mêjûvanan (Tierry, Guizot, Mignet, Tiers) dane bipeydakirin, yên ku wan li nik bi tevayîkirina rûdanan de nema dikarîbûn bi bê xebata çîniyan ve nala kilitê ji bona liberkevtina tevaya mêjûwa Firensî bêtin bitêgihandin. Lêbelê pêla dawîyî niha, ya ku ew bi pêla bi serkevtina bi carekêyî Botcuwazîyê ve, bi destgehên wênekirî ve, bi mafeyê helibijartina firehtirîn ve (gerjî ew ne bi tevayî ve), bi dema rojnameyên rojaneyî pir arzan ve, yên ku ew ji bona nava komên têtin bikevtin, ûhd têtê biderkevtin. Herwehajî ew bi pêla xurtirvanan ve têtê biderkevtin, yên ku ew bi Civatên Karkeran û Xwedîkaran ve têtin biderkevtin, yên ku ew xwe her û her didin didin bifirehkirin. Pêla ku ew xwe bi eşkerebûneke mezin ve (hegerjî ku ew xwe bi yekalî ve, bi "aşîî" ve bi rengêkî

²⁵Ji xwe re li Nivîstên Karl Marx/Friedrich Engels, bergê 31, r. 234 de bidin bitemaşekirin).

"desturî" ve) xebata çîniyan bi mîna palpêdana hêza di nav xwe de ji bona rûdanan de dide biderxistin. Ev cihê tê ji "Manifêsta komonistê" dê ji me re bide bixuyanîkirin, bê çî daxwaz ji bona lêvenerandineke bi serê xwe ve ji bona cihê her çîniyekê di civaka nuh de bi girêdanê ve ligel lêvenerandinê de ji bona mercên pêşkevtina her çîniyekê Marx ji zanistîya civakî didate bixwestin: "Ji hemû çîniyan, yên ku ew îro bi beramberî borcuwazîyê ve têtin birawestandin, bes û bi tenha ve Pirolitarya bi çîniyêke rastîyî şûreşgêr ve tète biderkevtin. Çîniyên din bi çêkirinên mezin re tèn û diçin, Pirolitarya bi berkirina wê ve bi xwe ve tète biderkevtin.

Desteyê Navînî, Çêkirvanên Biçûk, Bazirganên Biçûk, Destkar, Cotkar ew hemû bi hev re şerê Borcuwazîyê didin bikirin, da ku ew hebûna xwe nala Destê Navînî ji windabûnê bidin biparastin. Ew weha ne bi Şûreşgêr ve tète biderkevtin, lêbelê ew bi Xweparêz ve têtin biderkevtin, hêjbêtir ew bi Kevneperest ve têtin biderkevtin; jiber ku ew dixwazin çerxa mêjûwê ber bi paş ve bidin bizivirandin. Heger ku ew bi Şûreşvan ve bêtin biderkevtin, wehajî jiber ku ew xwe li ber kevtina ji bona nava Pirolitarya de didin bidîtin, weha ew li ber qazanca xweyî niha de nadin bidan, lêbelê ew li ber qazanca xweyî ayinde de didin bidan, weha ew dev ji bîr û bawerîyên xweyî bi taybetî ve didin biberdan, da ku ew xwe bi Pirolitarya ve bidin bivegirêdan".

Di rêzekê de ji nivîsandinên mêjûyî de (ji xwe re li navroka Kanîyan de bidin bitemaşekirin) Marx ji me re nimûneyekî bi şewq û kûr ve li ser zanistîya metiryalistîyî mêjûyî de û herwehajî li ser lêvenerandina her çîniyekê bi xwe ve, carcaran jî ji bona Gurûhên cudan jî yanjî Desteyan jî di nava Çîniyan de didate bidan û wî bi eşkere

49 Sê Kanî û Sê Pêkhatinên Markisistîyê

ve date bixuyanîkirin, çima û ji bona çî "her xebateke çînayî bi xebateke siyasî ve têtê biderkevtin". Ev letê, yê ku ew ji bal me de hatîye bianîn, dide bixuyanîkirin, bê kanî çiqasî bi dijwar ve tora pêwendîyên civakî, koçên veguhestinê ji çînîyekê ji bona ya din ji mêj de tanî ayinde têtin biderkevtin, ji yên ku Marx li wan de dide bilêvenerandin, da ku ew encamên hemû pêşkevtina mêjîyê bide bixuyanîkirin.

Bi kûrttirîn, giştirîn ve û bi dûr û dirêjtirîn bi rastîderkevtin ve û bi cîanîntir ve ji bona Dîtina Marx rêya wîyî abûrî têtê biderkevtin.

Rêya Marxî Abûrî

Marx di pêşgotina xwe de ji bona "Sermiyan" de dide bigotin: "Armanca dawîyî vê nivîsta hanê têtê biderkevtin, ku ew qanûna livandina abûrîya civaka nuh bide bixuyanîkirin", ango qanûna livandina abûrîya civaka Sermeyedarî, Borcuwazî bide bixuyanîkirin. Lêgerandina ji bona pêwendîyên berkirina civakeke mêtûyîyî nîşankirîyî heyî di peydabûna wê de, di pêşkevtina wê de û herwehaji di herifandina wê de - evaya bi xwe jî ve bi navka rêya abûrîyî Marx ve têtê biderkevtin. Di civaka sermeyedarî de berkirina mal -Warên- têtin bizalkirin û jibervêjî ve lêvenerandina Marx jî bi lêvenerandina li ser mal -Ware- de dide bidestpêkirin.

Hêjabûn

Mal -Ware- di yekem de bi tiştêkî ve tête biderkevtin, yê ku ew niyazmendîyeke Merov dide biqedandin; ew di duwem de bi tiştêkî ve tête biderkevtin, yê ku ew bi beramberî tiştêkî din ve tête biveguhertin. Sûdbexşîya tiştêkî wî ji bona hêjabûna bikarîne dide bikin. Hêjabûna veguhertinê (yanjî bi sadebûn ve hêjabûn) ew bi xwe ve bi endazîbûnekê ve tête biderkevtin, ya ku li gora wêna de têde ji mareke nîşankirî ji hêjabûnên bikaranî ji rengêkî xwe ligel rengêkî dinî bi jimareke nîşankirî ve ji hêjabûnên bikaranîn dide biveguhertin. Serpêhatîya rojane ji me re dide bixuyanîkirin, ku bi milyonan û milyardan karên veguhertinên wisa hemû, bi xwe jî ve di hêjabûnên bikarhatîyî cudan de û ne bi hevdû ve girêdayî ve her û her ligel hevdû de xwe bi mînahev ve didin bidanîn. Çi van tiştên cudan ji hev bi hev re dide bigirêdan, yê ku ew di rêstikeke nîşankirî de ji pêwendîyê civakî de her û her xwe ligel hevdû de didin bimînahevkin? Tiştê ku ew wan ligel hevdû de dide biyekkirin, ku ew bi berkirinên kar ve têtin biderkevtin, gava ku Merov berkirinan bi hevdû re didin biveguhertin, ew rengên cudan ji kar ligel hevdû de bi mînahevdû ve didin bidanîn. Berkirina mal bi rêstikekê ve ji pêwendîyên civakî tête biderkevtin, ya ku têde Durustvanên tekane durustkirinên cudan didin bidirustkirin (Parvekirina karê civakî) û ev hemû durustkirinên hanê li nik veguhertina bi hev re bi mîna hev ve têtin bidanîn. Ligelhevbûn, ya ku ew li nik tevaya mal -Waren- tête biderkevtin, weha ew xwe ne di karê rastîyî kirî de di şaxekî berkirinê de, ne jî ew xwe di karekî de ji rengêkî nîşankirî de dide bidîtin, lêbelê

ew xwe di karê Merovî Abstrakte -rût- de, belê ew xwe bi sadebûn ve di karê Merov de dide bidîtin. Tevaya hêza karî di civakeke heyî de, ya ku ew xwe ji hêjabûna hemû mal dide bipêkanîn, bes û bi tenha ve bi nala hêza karê Merov ve têtê biderkevtin. Bi milyardan ji pêrabûnên veguhertinê vê rastîya hanê didin bixuyanîkirin. Weha her malek bes û bi tenha xwe ve perçeyekî nîşankirî ji dema karê civakîyî divakirî dide biderxistin. Gewrebûna hêjabûnê dê di rêya perçeyekî nîşankirî ji karê civakîyî divakirî de, yanjî dê ew di rêya qedere karê civakîyî divakirî de, yanjî dê ew di rêya qedere karê civakîyî divakirî de ji bona dirustkirina malekî heye bête binîşankirin, yanjî dê ew di rêya hêjabûneke bikarîni heyî de ji dema karê civakîyî divakirî de bête binîşankirin. "Gava ku ew" (Merov) " durustkirinên xweyî ji hevdû cudan di bihevguhertinê de bi nala hêjabûnên wekhev de didin bidan, ew karên xweyî bi cudan ve ligel hevdû de bi nala karên Merovan ve bi wekhev ve didin bidanîn. Ew vê yekê nizanin, lêbelê vê yekê dikin". Abûrvanekî kevnar dayite bigotin: Hêjabûn bi endazîyekê ve di navbera Kesan de têtê biderkevtin, divabû ku wî bi hêsani ve bi ser gotina xwe ve bida bivekirin: ya ku ew bi rûyekî rapêçayî endazîyê metiryalî ve têtê biderkevtin. Bes û bi tenha ve ji dîtina rêstîka pêwendîyên berkirina civakî de ji rengekî civakîyî mêjûyî nîşankirî de yanjî ev jî ji pêwendîyên Merov dikare bête biliberkevtin, yê ku ew bi milyardan car xwe di rêya cemaweran de ji bona veguhertina li dûhevdû de bi hev re didin bixuyanîkirin. Merov dikare bête biliberkevtin, bê kanî hêjabûn çî ye. "Hemû hêjabûn di hemû mal de bes û bi tenha ve di pîvana dema karê

nîşankîrîyî kirî ve têtin biderkevtin"²⁶. Piştî lêvenerandineke bi dûr û dirêj ve ji bona herdu rûçikên karê gewdekirî di mal de Marx ji bona lêvenerandina li ser Rengê Hêjabûnê û Pûl de tete biçûyîn. Karê pêşî, yê ku Marx wî li ser xwe de dide bidanîn, di lêgerandina peydabûna rengên pûl û hêjabûnê de, di lêgerandina kirinên mêjûyî de di veguhertinê de, ji yên bi tenha xwe ve, ji karên veguhertinên li hevrashatî de (" ji rengên hêjabûnên sade, ji yên bi tenha xwe ve û ji yên li hevrashatî de"); komeke nîşankirî ji malekî beramberî komeke nîankirî ji malekî din pê tete biveguhertin) tanî rengê hêjabûna tevayî, gava ku jimareke ji malên cudan beramberî yekekî din bi malekî dinî nîşankirî ve tete biveguhertin û tanî ji bon ser rengê pûl ji hêjabûnê, yê ku li nik vî malê nîşankirî de bi nala zêr ve tete biderkevtin, yê ku tete wekwehvbûna tevayê tete biderkevtin. Pul bi nala berztirîn durustkirina pêşkevtina bihevguhertinê ve û bi malberkirinê ve ew rûçikê civatê û privaten Arbeiten - Karên Xweyîtîyan-, pêwendîyên civakî di navbera Durustvanên Tekane de, yên ku ew di rêya bazarê de hatine biyekkirin, dide bixapandin û bipoşandin. Marx karên cudayî peran ber bi lêvenerandineke dûr û dirêjî pir hûr û kûr ve dide bixistin. Li vir jî de (herweahjî bi carekê ve mîna ku di derîyên pêşîyî "Sermiyan" de) pir bi giringî ve divê bête bigotin, ku derxistina rengê rûtî bi serê xwe ve ji bona daxuyanîkirê di rastîya rastî de kanîyên xurtî dewlemend li pêşçûna mêjûwa veguhertinê û berkirina mal de dide biderxistin. "... Pere... tanî radeyekî berzbûneke nîşankirî ji bihevguhertina mal dide

²⁶Ji xwe re li Nivîstên Karl Marx/Friedrich Engels, bergê 4, r. 462/463 û 472 de bidin bitemaşekirin).

bimerckirin. Rengên codayî peran, yên ku ew bi Warenäquivalent -wekhevûneke sadeyî mal- ve têtin biderkevtin, yanjî yên ku ew Zirkulatinsmittel -bi çara dan û sitendinê ve- têtin biderkevtin, yanjî yên ku ew Zahlungsmittel -bi çara pere dayînê ve, Schatz -bi xiznê ve- û Weltgeld -bi perê cîhanî ve têtin biderkevtin, ew li gora bi serkevtina vî karî yanjî yên din ve li ser qonaxên cudan de ji kirinên berkirina civakî de xwe didin bixuyanîkirin". ("Sermiyan" Bergê I)²⁷.

²⁷Ji xwe re li Nivîstên Karl Marx/Friedrich Engels, bergê 23, r. 15/16 û 88 de bidin bitemaşekirin).

Hêjabûna Bêtir

Li ser pileyekî nîşankirî ji pêşkevtina berkirina mal pere xwe ji bona sermîyan didin biveguhestin. Rêza gerandina berkirina mal weha dihate biderkevtin: M (Mal) - P (Pere) - M (Mal), ango mal tête bifirotin, da ku malekî din bête bikirîn. Rêzanan sermîyanî tevayî bi servajîvêjê ve wetov tête biderkevtin: P - M - P, ango dikirin, da ku (ligel qazancê de) bidin bifirotin. Marx vê gewrebûna hanê bi beramber hêjabûna kokê ve di gerandinê perên danînê ve bi hêjabûna Bêtir ve dide binavkirin. Rastîya vê "Gewrebûna" peran di gerandina sermiyandârîyê de bi tevayî ve bi nas ve tête biderkevtin. Bi xwe ve ev "Gewrebûna" hanê peran ji bona sermîyan dide biveguhestin. Ev bi nala pêwendîya berkirineke civakîyî mêjûyîyî nîşankirîyî taybetî ve tête biderkevtin. Hêjabûna bêtir nikare xwe ji gerandina berkirina mal bide biderkirin; jiber ku ev bes û bi tenha ve bi hevguhertinên nalahev ve dide binaskirin; herwehajî ew nikare xwe ji bazarkirinê bide biderkirin; jiber ku dê zîyan û qazanc li nik Kirîvanan û Firotvanan de xwe bi nalahevdu ve bidin bikirin, belê ev yeka hanê bi xuyanîyeke civakîyî nivîyî tevayî û ew xwe ne bi xuyanîyeke yekane ve dide bireftarîkirin. Ji bona bi destxistina Hêjabûna Bêtir ve divê Peredar... li bazarê de ji xwe re malekî... bide bidozandin, ku Hêjabûna Bikaranîna wîna bi xwe ve rewşeke wîyî bi taybetî ve bête biderkevtin, ya ku ew dê bi kanîya Hêjabûnê ve bête biderkevtin", Malekî weha ku bikaranîna wêna bi rastî pêrejî ve hêjabûnê bide bipeydakirin. Bi rastî jî ve malek

wetov nayête bidîtin. Evayajî bi hêza karê Merov ve têtê biderkevtin. Bi karanîna wêna di kar de têtê biderkevtin û kar hêjabûnê dide bipeydakirin. Peredar hêza kar bi hêjabûna wê ve dide bikirîn, ya ku dê hêjabûna wêna nala her malekî din bi dema karê civakîyî divayî ve ji bona berkirina malekî din bête binîşankirin, ya ku ew ji bona durustkirina wîna têtê bipêwistîkirin (ango di rêya xercîya ji bona jîna wî û mala wî de têtê bidîtin).

Gava Perdar hêza kar ji xwe re dide bikirîn, weha jê re bi mafe ve têtê biderkevtin, ku ew wî karê hanê bide bikaranîn, ango wî di tevaya rojekê de, emê 12 demjimarane bidin bigotin, ku dê ew wî bihêle bide bikarkirin. Di nava vî karê hanê de di 6 demjimarane de di "karê divayî" de Karker durustekî dide bidurustkirin, ku di rêya wê de xercîya jîna xwe û mala xwe dide biderxistin, lêbelê di nava dema mayî de ji 6 demjimarane de (dema karê "Bêtir") de ew Berkirineke "Bêtir" yanjî Hêjabûna Bêtir dide bidurustkirin, ya ku ew ji bal Sermiyandar de nehatîyê bikirîn. Bi pê vê ve divê Merov ji alîyê kirinên berkirinê de di nava du perçên sermîyan de bide bucu dakirin: Sermîyanî Rawestyayî, yê ku ew ji bona çarên berkirinê (mekînan, destikên kar, tiştên xav uhd.) têtê bixerckirin - hêjabûna wîna (di yek carê de yanjî di perçan de) bi bê guhertin ve ji bona ser berkirina durustkirî de têtê biçûyîn- û Sermîyanê Livandî, yê ku ew ji bona hêza kar têtê bixerckirin. Hêjabûna vî sermîyanê hanê bi mîna xwe ve nayête bimayîn; lêbelê dê ew di rêya kirina kar de bi afirandina hêjabûna bêtir ve bête bigewrekin. Da ku pileyê çewisandina hêza kar di rêya sermîyan de bidin biderxistin; jibe vêjî ve Merov Hêjabûna bêtir ne ligel tevayas sermîyan de, lêbelê ligel sermîyanê livandî de dide biberamberîkirin. Di Rate -Naverasta- hêjabûna bêtir,

mîna ku Marx vê endazîyê dide binavkirin, weha dê di nimûna me de 6:6 ve bête biderkevtin, ango sed der sed dê bête biderkevtin.

Mercê mêjûyî ji bona peydabûna sermîyan di yekem de di civandina komkirineke perên nîşankirî de di nava destên jimarekê ji Merovan de tanî radeyekî bilind di pêşkevîneke berz de ji berkirina mal de tête bidîtin, di duwem de di hebûna Kargerên "Azad" de bi herdu têgihîştinan ve tête bidîtin, yên ku ew bi azad ve ji her bergirtinekê ve yanjî ji her sînorkirinekê de li nik firotina hêza karê xwe ji erd û zevî û herwehaji ji çarên berkirinê de bi carekê ve têtin biderkevtin, ango ku hebûna Karegeran bi tu Mîrzayekî ve nayête bigirêdan, ango "pirolitar" bes û bi tenha ve ji firotina hêza karê xwe dikare pê bête bijîyandin.

Hêjabûna Bêtir bi du rêyên bingehî ve dikare bête bigewrekin: Ew di rêya dirêjbûna roja kar de ("absoluter Mehrwert" -Hêjabûna Bêtirbûna Bi carekê ve-) û herwehaji di rêya kurtkirina roja karê divabûyî de ("relative Mehrwert" -Hêjabûna Endazî-) dikare bête bikin. Li nik lêvenerandinê de Marx li rêya pêşî de wêneyekî pir şeng ji bona xebata çînîya Karger ji bona kurtkirina roja kar û herwehaji pêrejî destdirêjîya dewletê di pêşî de ji bona dirêjkirina roja kar di (sedsalên çardehan tanî sedsalên heftdehan de) û di pişt re ji bona kurtkirina roja kar di (derkirina qanûnên Fabrîkê de di sedsalên nozdehan) de date bineqîşkirin. Ji dema çapbûna "Sermîyan" de mêjûwa tevgera Kargeran li hemû welatên bajartî de li dunyê de bi hezaran hezaran ve rastîyên nuh hatin bipêşkeşkirin, yên ku ew wî wêneyê hanê di neqîşkirina wî de didin bidawîkirin.

Li nik lêgeradnina xweyî ji bona berkirina

hêjabûna bêtirî endazî de Marx li hersê koçên mêjûyî bingehî de ji bona berzkirina berê berkirinê di rêya sermîyandarîyê de lê dide bitemaşekirin: 1. Hevkarîya sivik; 2. Parvekirina kar û Manufektur; 3. Mekîne û çêkirina gewre. Bê çiqasî Marx li vêderê de bi kûrî ve xêzên bingehîyî rûçikên pêşkevîna sermîyandarîyê dide biderxistin, weke ku ew têtê bidiyarkirin, ku lêgerandin li ser çêkirinê de, ya ku jêre li Rusya de bi "çêkirina Destkarîyî Gundî" ve têtê bigotin, kanîyên pir bi dewlemend ve ji bona neqîşkirina herdu xalên pêşî ji sê koçên bingehîyî bi navkirîyî çûyî de dide bipêşekirin. Lêbelê kêra şûreşgêrîyî çêkirina mêkanîkîyî mezin, mîna ew ji bal Marx de der sala 1867 hatîye binivîsandin, bi derbasbûna dema nîvsedsalî ve xwe di nava jimarekê de ji welatên "nuh" de (Rusy, Çapan ûhd.) date bieşkerekirin. Hêjîbêtir pir bi giringî û nuh ve lêvenerandina Marx li ser Komkirina Sermîyan de, ango veguheştina beşekî ji Hêjabûna Bêtir ji bona sermîyan têtê biderkevtin, ku ev beşê hanê ne ji bona niyazmendîyên xweyîtî yanjî ji bona kêfxweşîya Sermîyandaran têtê bixerckirin, lêbele ew ji bona berkirineke nuh têtê bixwerckirin. Marx şaşbûna tevaya abûrîya siyasîyî kilasîkîyî berê (ji dema Adam Smith) date bieşkerekirin, ya ku wê ji xwe re didate bidîtin, ku hemû Hêjabûna Bêtir, ya ku ew ji bona Sermîyan dihate biveguhestin, bi ser Sermîyanê Livandî ve dihate bivekirin. Belam di rastîya rastî de ew ji bona Çarên Berkirinê û Pêrejî ji bona Sermîyanî Livandî têtê biparvekirin. Bi gewrebûneke pir giring ve di kirina pêşkevîna sermîyandarîyê de û veguheştina wêna ji bona sosyalistîyê bi rastî ve têtê biderkevtin, ku beşê Sermîyanê Rawestyayî (beramber bi tevaya Sermîyan ve) bi leztir ve ji leza Sermîyanê Livandî ve têtê bigewrekirin.

Di dema ku komkirina sermîyan bi leztir ve şûna Kageran di rêya mekînan de dide bigirtin û ew li serekî de dewlemendîyê dide bidurustkirin û ew li serê din de perîşanîyê dide bidurustkirin. Herwehajî ew wê dide bidurustkirin, ya ku Merov jê re bi "Industrielle Reservearmee" -Sipahê hilanînîyî çêkirinê- û "relative Überfließ" - endazîya Mişebûnê- ji Kargeran, yanjî "kapitalistische Überbevölkerung" - Mişebûna Xelkêyî Sermîyandarî- dide bigotin, ya ku ew ji xwe re zor rengên cudan dide biwergirtin û ew ji bona sermîyan rê pê dide bidan, ku ew berkirinê bi pir lez ve bide bifirehtirkirin. Ev bi rêdana hanê ve bi girêdanê ve ligel Kredit -kirêdîtî- û komkirina sermîyan de di çarên berkirinê de ji me re kilîta liberkevtina ji bona Krise -Tengavîyî- di rêya Überproduktion -bibêtirbûna berkirinê de dide bipêşkeşkirin, ya ku ew di navav welatên sermîyandarî de bi pêl ve tête birûdan, di pêşî de ew di her 10 salan de, di pişt re bi dirêjtir ve û bi leztir ve belam bi kurttir ve di nava demên nîşankirî de tête birûdan. Ji komkirina sermîyan li ser bingehe sermîyandarîyê de divê ji komkirina jê re gotî ursprüngliche Akkumulation -komkirina kokêbête bicudakirin, ya ku têde parvekirina Kargeran bi darê zorê ji çarên berkirinê ve, biderkirina bi darê zorê ve ji Cotkaran nava zevîyên wan de, bi talankirina erdên tevayî ve, bi sustêma kolonyalî ve, bi deynên dewletê ve, bi parastina gomrikî ve ûhd. dihatin biderkevtin "Ursprüngliche Akkumulation" -Komkirina Kokê- di serekî de Pirolitarîyên "Azad" û di serê beramber de Peredar, Sermîyandar didte bidurustkirin.

"Berê Mêjûyî ji Komkirina Sermîyandarîyê" li nik Mrax de bi van gotinên bi nav û bang ve têtin bidiyarkirin: "Ji çewisandina Berkirvanên xweser bi bêtirîn dilsertî ve

pir dûr ji mehrebaniyê û dilovaniyê di bin palpêdana nizimtirîn, pîstirin û bi kîntirina ji dil û can ve tete bikirin. Xwedîbûna taybetî, ya ku ew ji bal karê xwedîyê xwe ve bi xwe ve "Karê Cotkar û Destkaran" hatiyê biwergirtin, ew tete bibingehkirin, weha Merov dikare bide bigtin, ku bihev girtina Xebatkerê bi tenha xwe ve û bi serê xwe ve ligek mercên karê xwe de ew ji bal sermîyandariya xwedîbûna bi taybetî ve cihê wî tete bigirtin, ya ku ew li ser çewisandina biyanî tete bibingehkirin, lêbelê ew bi bes û bi tenha ve bi nav ve li ser karê azad de tete bibingehkirin...Tiştê ku ew niha tete biçewisandin, nema êtir bêtir Kargerê ji xwe re dide bixebatkirin, lêbelê pir ji Kargeran ji bal Sermîyandar de tetin biçewisandin. Ev çewisandina hanê xwe di rêya yarîkirina qanûnên pir giringî berkirina sermîyandariyê de bi xwe ve, di rêya lihevkomkirina sermîyan de tete bitengalkirin. Herwehaji her Sermîyandarek gelek Sermîyandarên din dide bikuştin. Dest bi dest ve ligel vê lihevkomkirina hanê de yanji çewisandina pir Sermîyandaran di rêya hindikan de şeweyê hevkarîya kirina kar her û her li ser pileyekî pêşkevtinê de xwe dide bidîtin. Bikaranîn zanistîya teknîkîyî bi şirabûn ve, bi şeweyî pilankirî ve ji bona çewisandina erdê, di guhertina çarên kar bes û bi tenha ve ji bona çarên karê bi hev re bi karhatî ve, abûrîkirina hemû çarên berkirinê di rêya bi karanîna wan ve nala çarên berkirina karê civakîyî bi hev re, di hevtina hemû miletan de di tora bazara cîhanî de û pêrejî rûçikê cîhanîyî sustêma Sermîyandarî tete biderkevtin. Bi her û her kêmbûna jimara Sermîyandarên gewre, yên ku ew ji xwe re sûdbexşiyê ji vê kirina veguhestinê di wergirtinê û monopolîkirinê de didin bigirtin, gewrebûna perîşaniyê, zordariyê, koletiyê, jêrbûnê, çewisandinê tete bige-

wrekirin; lêbelêjî pêrejî her û her çîniya Karger tête biberz-
kirin û ew di rêya mêşanizma kirina berkirina sermîyan-
darîyê de Kargerên Xwendewar, ligel hev de bi rêxistî ve
yanjî sazmandîyê çîniya Kargeran tête bigewrekirin.
Monopilikirina sermîyan dê bi bend ve ji bona şeweyê
berkirinê ve bête bikirin, ya ku ew ligel wî de û di bin wî
de hate bigeşkirin. Bi serhevdana çarên berkirinê ve û bi
civakkirina kar ve ew bi deqekê ve têtin bigihandin, ku ew
nema dikarin di nava qalikê xweyî sermiyandarîyê bêtin
bimayîn. Ew dê bête bipeqandin. Demjimara zengilê dawî
Xweyîtiya taybetîyî sermîyandarî tête bilêdan. Dê ji
Talankeran talan bête bisitandin". ("Sermîyan", I).

Hêjbêtir zor bi giringtir û nuh ve lêvenerandina
Marx di bergê II de ji "Sermîyan" li ser venuhkirina
berkirina tevaya sermîyandarî civakî tête biderkevtin. Li
vir jî de Marx li xuyabûneke Neferî nade bitemaşekirin ew
li xuyabûneke tevayî dide bitemaşekirin, ew li perçeyekî ji
abûriya civakê de nade bitemaşekirin; lêbelê ew li vê
tevaya abûriyê de di tevaya wêyî civakî de dide
bitemaşekirin. Marx şaşbûna Kîlasîkîyên li jor de gotî dide
birastkirin, ew tevaya berkirina civakî ji bona du beşên
mezin dide biparvekirin: 1. Berkirina çarên berkirinê û 2.
Berkirina çarên bikaranînê û ew li ser bingehên jimarên li
ber destan de ji bona nimûne li ser gerandina tevaya
sermîyandarê civakî de bi hev re dide bitemaşekirin, weha
ew li ser venuhkirina berkirinê de çi warê di berkirina
sivik de û çi jî di pêla komkirina sermîyan de dide
bitemaşekirin. Di bergê III ji "Sermîyan" de pirsîyarîya
pêkhatina Durchschnittsprofitratte - Naverasta qazancê- li
ser bingehê qanûna hêjabûnê de hate biçarekirin. Yekek ji
gewretirîn pêşkevtinên zanistîya abûrî tête biderkevtin, ku
Marx li nik lêvenerandina xwe de ji xuyabûna abûriyî

teveyî, ji tevaya abûrîya civakî dide bidestpêkirin, lêbelê ew di lêgerandina xwe de ne li ser xuyanîyekê de bi tenha xwe de, yanjî xuyanîyekê de ji berberîya derve dide bitemaşekirin, mîna ku abûrîya siyasîyî pûç xwe yanjî "Dîtinên kara dawî" nuh li ser de didin bisînorkirin. Di pêşî de Marx li ser peydabûna Hêjabûna Bêtir dide bilêvenerandin, ji bona ku di pêşî de perçebûna wêna di Qazancê de, di karê û kirya erd de bide biderxistin. Qazanca endazîya hêjabûna bêtir ligel tevaya Sermîyanekî danînê de di kargehekê de tete biderkevtin. Sermîyanê ku ew bi "hoher organischer Zusammensetzung" -bilind ve tete bipêkhatin- (ango bi pîrbûn ve ji sermîyanekî rawestayî beraberî sermîyanekî livandî ve di naverasteke civakî de bi pîvaneke bilindtir ve) jê pîvana qazancê tete biderkevtin, ya ku ew bi kêmtir ve ji pîvana qazanca Naverastî tete biderkevtin. Sermîyan ku ew "di pêkhatina xwe de bi kêm ve" tete biderkevtin, ew pîvana qazancekê dide bidan, ya ku ew bi bilindtir ve ji ya naverastê tete biderkevtin. Berberî di navbera sermîyanan, veguhestina wanî azad ji şaxekî berkirinê ve ji bona şaxekî din jê di her caran jî de pîvana qazancê bi naverastîyê de didin biwekhevkirin. Teva hêjabûnên hemû mal di civakeke nîşankirî de wek tevaya buhayên têtin biderkevtin; lêbelê di kargehekê de bi tenha xwe ve û herwehaji di şaxên berkirinêyî bi tenê de dê mal li jêr kêra berberîyê de ne li gora hêjabûna xwe de bêtin bifirotin, lêbelê dê ew li gora buhayên berkirinê de bêtin bifirotin, yê ku ew bi mîna sermîyanê xerckirî û bi serdejî ve qazanaca naverast ve têtin biderkevtin.

Rastîya bi nav û bang ve û lê ne bigûmankirî ve ji cudabûna buhabûnan ligel hêjabûnan de û di wekhevbûna qazancê de weha ew ji bal Marx de li ser bingehê qanûna

hêjabûnê de hate bieskerekirin; jiber ku tevaya hêjabûna mal ligel tevaya bûhabûnên wan de bi mînahev ve têtê biderkevtin. Lêbelê bi vegerandin hêjabûna (civakî) ji bona ser buhayên (tekane) ne bi rêyeke hêsan ve, xweser ve têtê biderkevtin, lêbelê ew bi rêyeke zor dijwarî tevlihev ve têtê biderkevtin. Bi carekê ve bi serûştî ve têtê biderkevtin, ku di civakekê de Durustvanên berkirinê yên ji hev belawela, yên ku ew bes û bi tenha ve di rêya bazarê de bi hev re têtin bigirêdan, qanûnmendî bes û bi tenha ve dikare xwe bi nala naverastê ve, bi civakî ve, bi tevayî ve bide biderxistin, ev jî di rêya xwe bi xwe ve hilanîna cudabûnên tekane ve ji vî alî yanjî ji alîyê din de têtê biderkevtin.

Berkirina berê kar bi lezbûna gewrebûna sermîyanê rawestyayî ve bi beramberî sermîyanê livandî ve dide biderxistin. Lêbelê ji ber ku hêjabûna bêtir bes û bi tenha ve bi karê sermîyanê livandî ve têtê biderkevtin, weha jiber vê jî ve têtê biliberkevtin, ku Profitrate -Pîvana qazancê- (endazîya hêjanûna bêtir ligel tevaya sermîyan de, lêbelê ne ligel perçê wîyî livandî de) berekî ber bi jêrbûnê ve ji xwe re dide bigirtin. Marx bi hûr û kûrî ve li vî berî de dide bivenerandin û herwehaji ew li wan nîrên wê de didin bivenerandin, yên ku ew xwe li ber de didin biveşartin, yaxud yên ku ew xwe li ber wê de didin bigirtin. Bêyî ku em xwe li cem derîyên pir giring de di bergê III de bindin birawestandin, yên ku ew xwe ligel sermîyanê selefê, sermîyanê bazirganîyê û sermîyanê peran de dide bireftarîkirin, em xwe ji bona ser giringtirîn tişt didin biveguhêstin: Theorie der Grunrente -Dîtina Kirya Erd-. Buhayê berkirinên çandinîyê li encamê bi sînorkirina topraxa erdê ve, ya ku ew bi carekê ve di welatên sermîyandar de di nava destên Zimîndarên tekane de têtê

